HILBIJARTINA HERÊMÎ YA 2024'AN

# BEYANNAMEYA HILBIJARTINÊ YA JINAN

## DEMA JINAN VÎNA JINAN

DEM PARTİ

MECLISA JINAN


DEMA JINAN VÎNA JINAN
DEMÊ CINÎYAN ÎRADEYÊ CINÎYAN
DEMÊ CINÎYAN ÎRADEYÊ CINÎYAN
JIN JIYAN
DEMA JINAN VÎNA JINAN

***Bi baweriya ku me ji têkoşîna jinê wergirtiye,***

***Bi mîrateya ku ji dîroka me ya berxwedanê maye,***

***Bi ruhê Jin, Jiyan, Azadiyê,***

***Em bi ser ketin, em ê dîsa bi ser bikevin!***

***BI VÎNA JINÊ BER BI DEMOKRASIYA XWECIHÎ VE!***

Bi nûneriya wekhev û pergala xwe ya hevserokatiyê ya ku dike ku jin di siyasetê de û di mekanîzmayên rêveberiyên xwecihî de cih bigire, di cîhanê de cara pêşîn ji aliyê me ve hatiye sepandin û di tevahiya cîhanê de wek yek ji mînakên herî pêşketî yê rêgezên demokratîk û wekhevîparêz tê destnîşankirin, di rêya wekheviya teqez de me gelek gavên girîng avêtin.

Di rêveberiyên xwecihî yên ku erkê didin destê kesekî, zêde navendî dibin û wek qada peywirê ya xwezayî ya mêr hatiye kodkirin, sepandina nûneriya wekhev hem siyaset demokratîk kiriye û hem jî careke din derxistiye holê ku siyaseta demokratîk yek ji hîmên bingehîn ên civakê ye.

Me tu caran hilbijartinên xwecihî wek sindoq, rêveberiyên xwecihî jî wek avahiyên şaredariyan pênase nekir û nedît. Dijberî partiyên pergalê yên ku sindoqê û avahiyên şaredariyan ji bo mêtingeriya xwecihî, rant û talên bi kar tînin; di hişmendiya me ya rêveberiya xwecihî ya demokratîk de, armanca me ew e ku em qadên xwecihî li gor pêdiviyên çandî, xwezayê û bi hişmendiya azadîparêziya jinê hêzdar bikin.

Aliyê rêveberiyên xwecihî yê têkoşîna me ya ku me li Cirnê Reş di sala 1978'an de bi 3 endamên meclîsa şaredariyê yên jin dest pê kir, hemleyeke şoreşgerî ya ku li erdnîgariya me ya ku nasnameya jinê tune tê hesibandin, çavkaniyên xwecihî û erk di binê kontrola dewletê û mêr de ne, her ku diçe mezin dibe û her ku diçe hêzdar dibe ye.

Me kir ku siyaseta xwecihî ji wargehbûna desthilatdariya mêrane derkeve. Me ligel şaredarî, meclîsên parêzgehan ên giştî, meclîsên şaredariyan û keyatiyan; komele, yekîtî, tevger, însiyatîf û rêxistinbûnên ku di hiyerarşiya hiqûqî ya rêveberiyên xwcihî de cih nagirin lê ji bo demokrasiya xwecihî jêneger in jî bi rêxistinbûnên xwe yên jinan ên xweser, bi perspektîfeke wekheviya zayendî birêxistin kir, ava kir.

Perspektîfa rêveberiyên xwecihî yên demokratîk ên azadîparêziya jinê ya ku bi pêşengiya me jinan hat avakirin, ligel kêmasiyên bivênevê û têrnekirinên ku dibe hatibin jiyîn jî ne bi tenê ji bo yên li erdnîgariya me, ji bo têkoşînên jinan ên li welatên ku wek demokrasiyên pêşketî yên cîhanê tên binavkirin jî rê nîşan da û hîna jî rê nîşan dide.

**Lewra bi destê jinê avakirina jiyanê, xwedîderketina jinan a li jiyana xwe, di her asta mekanîzmayên biryargirtinê yên xwecihî de xwedîgotinbûn û bi vê hişmendiyê xurtkirina qadên xwecihî hem di aliyê hişmendiyê de û hem jî di jiyana civakî de veguherînên girîng derxistiye holê.**

Em îro bi têkoşîna xwe ya nêzî 50 salan û ezmûnên ku têkoşîna me derxistine holê, ligel hemû êrîş û reşkirinên desthilatdara dijmina Kurdan, dijmina jinan û siyasetên ku li ser rêça wê dimeşin û reşkirinên wan jî em li hemberî herka dîrokê destwerdanê pêk tînin. Em derfeta diyarkirina rêya dîrokê ji binê desthilatdariya wan û yekdestiya wan derdixin; em bi modeleke demokratîk a ku jinan, bindestan û hemû derdorên civakî yên ku li qadên xwecihî dijîn beşdarî pêvajoyên biryargirtinê dike, dîrokeke pir cuda dinivîsin.

## *Em ê Hêza Xwe ya Polîtîk Her Tim ji Dîroka Xwe Wergirin!*

Di hilbijartinên 1999'an de, bi çar şaredariyên jinan ên ku me li Bazîd, Qoser, Dêrik û Giyadînê bi dest xistin, di serî de têkoşîna li dijî her cureyê tundiya li hemberî jinê, me li qadên xwecihî kir ku jin hem jiyana xwe ava bikin û hem jî jiyana xwecihî bi destê jinê bê avakirin. Ew 4 şaredarî bûn qadên pîlot ên sepandina vê siyasetê.

Di hilbijartinên xwecihî yên 2004'an de, ligel bêperwabûna êrîşên dewlet û desthilatdariyê yên nijadperest û zayendparêz û bi taybetî jî êrîşên wan ên li dijî têkoşîna me ya jinê, me gavekî bi tenê jî paş ve neavêt. Dijberî wê, me têkoşîna xwe geştir kir, zêdetir bi pêş ve bir. Me di rêveberiyên xwecihî de, me serkeftina xwe ya şaredarên jin û nûneriya jinê ji %300 zêde kir. Vê serkeftinê bi tenê têkoşîna jinê di siyaseta xwecihî de şênber nekir, di heman demê de kir ku têkoşîna jinê rengekî saziyî wergire û deskeftî mayînde bibin. Ji ber vê yekê jî di têkoşîna me de bûn gavekî girîng.

Di hilbijartinê xwcihî yên 2009'an de jî, wek cara pêşîn, kotaya jinê hat ragihandin û gelek herêm bi tenê ji bo serlêdanên jinan hatin veqetandin. Em ji têgihîştina "bi jinê serkeftin pêk nayê" derbasî "bi jinê serkeftin pêk tê" bûn û bi vî awayî jin bûn kiryarên girîng ên rêveberiyên xwecihî. Bi qotaya jinê, şaredariyên bi dehan bajarok, navçe û bajaran cara pêşîn ji aliyê jinan ve hatin birêvebirin. Siyaseta jinê ji aliyekî ve li qadên xwecihî qodên mêrane yên zayendparêz û serdest şikênandin û li aliyê din jî pêdiviya bi rêveberiyên wekhev û demokratîk careke din derxist holê.

Di hilbijaritnên 2014'an de, li ser bingeha van hemû têkoşîn û ezmûnan, me modela rêveberiyên xwecihî ya xweser û demokratîk pejirand û hem li meclîsên şaredariyan û hem jî li meclîsên parêzgehan ên giştî pergala hevserokatî û nûneriya wekhev pêk anî. Ligel ku berê mînakek tune bû û di pêkanînê de

jî gelek pirsgirêk hatin jiyîn jî, ji 102 şaredariyên me, di 96'an de, di şûna rêveberiya ku hemû erk di destê kesekî de bû, me pergala hevserokatiyê ya ku jin û mêrekî pêk dihat bi awayekî serkeftî sepand. Bi vê serkeftin û biryardariyê hevserokatî bûye pergaleke bingehîn a jêneger a ku îro ji modeleke rêvebirinê wêdetir, kiriye ku jin wek hevserok bibin kiryarên diyarker ên nûnertiya wekhev û polîtîkayên rêveberiya xwecih a demokratîk û ev model bûye xwediyê rengekî saziyî.

### *Ligel Rejîma Qeyûman a Dijminê Jinan û Kurdan Jî, Me Dev Jê Berneda, Em ê Dev Jê Bernedin!*

Ji ber ku jin di siyasetê de bû kiryar, rêveberiyên xwechî bi beşdariya jinan û hemû derdorên ku li qadên civakî dijîn rengekî demokratîk wergirt, gel bû xwediyê gotin û biryarê, bajar ji bûyîna qada rant û talanê derxist bê guman bû armanca êrîşên giran ên desthilatdariyê.

Desthilatdariya AKP û MHP'yê ya ku dijminatiya Kurdan a dîrokî veguherand polîtîkayeke tunekirinê ya berfireh, wek parçeyekî plana çokdanînê vîna gel û bi taybetî jî ya jinan xesp kir, bi



peywirdarkirina qeyûmên ku ji serayê hatin peywirdarkirin, dest danî ser şaredariyên me. Hewl da ku hevşaredarên me krîmînalîze bike û modela me ya rêveberiyên xwecihî ya demokratîk têk bibe.

Qeyûmên ku bi detê AKP û MHP'yê hatin peywirdarkirin destkeftiyên me yên ku me bi têkoşîneke giran û berdêlên mezin bi dest xistibûn rasterast kirin armanc û xwestin ku tune bikin. Qeyûmên ku bi fermana Serayê tevdigeriyan navenên têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê girtin û ev sazî veguherandin "navenda malbatê". Qaşo di binê navê "parastina yekîtiya malbatê" de tundiya li hemberî jinê zêde û rewa kirin.

Niha em bi pêngaveke dîrokî dîsa pergaleke ku heta niha nehatiye sepandin bi ezmûneke demokrasiyê ya girîng beşdarî hilbijartinên 2024'an dibin. Me modela pêşhilbijartinê ya ku hemû derdorên ku li qadên xwecihî dijîn bi vîna xwe ya azad û biryara hevpar ango bi lihevkirina bajêr berendam hatin diyarkirin, bi serkeftineke mezin pêk anî. Wek jin, em bi awayekî bi hêz û berfireh beşdarî pêşhilbijartinan bûn û berendamên xwe, me jinan bi xwe diyar kir. Li dijî siyaseta mêrane û yekparêz a rêveberiyên xwecihî, bi pêşengiya jinan, lihevkirina bajêr û modela pêşhilbijartinê



sînerjiya ku me afirand, em bawer in dê xeta me ya rêya sêyemîn mezintir bike.

Polîtîkayên şer û tundiyê di pergala kedxwariyê ya li ser bingeha keda netomarkirî, bê ewlehî û erzan de bi xwe re xizaniyeke pir zêde û qeyraneke aborî ya pir giran aniye. Ev xizanî di serî de jin, li piraniya civakê belav bûye. Li dijî polîtîkayên ku xizanî kirine rêbaza rêvebirin û kontrolkirina gelan, em ê modela xwe ya rêveberiyên xwecihî ya demokratîk a ku pêşekiyê dide hilberîna jinan zêdetir bi hêz bikin. Li dijî yên ku ji sifreya me û nanê me didizin, em ê aboriya jiyana nû careke din bi jinan re ava bikin.

***Em Li Pergala Xwe Ya Rêveberiyên Xwecihî ya Demokratîk Xwedî Derdikevin û Bi Pêşengiya Jinan Avakirina Jiyana Nû Didomînin!***

Ligel pêkutî û êrîşan, tundî, qeyûm û polîtîkayên dijminnên jinan û Kurdan ên ku desthilatdarî ji bo mayîndekirina faşîzmê her roj bi sepaneke nû derdixe holê, em ***JI BO RÊVEBERIYÊN XWECIHÎ YÊN BI VÎNA JINÊ*** careke din tên ku yên ji me hatine



dizîn paş ve bigirin. Em bi ser ketin, me bi dest xist. Em niha tên ku serkeftina xwe û destkeftiyên xwe mezin bikin.

Em ê bi hêz, hişmendî, biryardarî û baweriya xwe ya bi rêxistinbûnê bixebitin, bi hev re ava bikin û destkeftiyên xwe zêde bikin.

Bi hêza jinê ya veguherîner, em ê avakirina siyaseta demokratîk û jiyaneke wekhev a li qadên xwecihî bidomînin.

Bi pergala hevserokatiyê; em ê belavkirina di hemû qadên jiyanê de hêzdarkirina vîna jinê, bi her awayî beşdarbûna pêvajoyên birêvebirina bajêr û hişmendiya rêveberiyên xwecihî ya demokratîk bidomînin.

Hevserokatiya ku mîsogeriya maf û azadiya jinan e û me bi ked û berdêleke giran sepandiye, polîtîkayên xwe yên ku nûnertiya wekhev, azadîparêziya jinê, bi beşdarî, pirdeng, demokratîk û xwezaparêz esas digirin bi israr bisepînin.

Bi rêgeza xwe ya nûnertiya wekhev û pergala xwe ya fermûarê, em ê wek yek jin û yek mêr, navnîşên şaredarî û meclîsên parêzgehan ên giştî diyar bikin û vê pergala xwe bidomînin.

Em ê di rêveberiyên xwecihî de hevkarî, piştgirî û hevgirtina jinan a herêmî, neteweyî û gerdûnî berfirehtir bikin.

Em ê bi piştgiriya xwe ya jinan, hêzê bidin avaniya qadên xwecihî yên pirnasnameyî, pirçandî û pirzimanî û bikin ku hemû jin beşdarî mekanîzmayên biryarwergirtinê bibin.

Di hişmendiya me ya şarevaniyê ya li ser bingeha pirçandî û xizmeta bi zimanê dayîkê de, em ê ji aliyê maf û erkan ve bi awayekî wekhev nêzî hemû kom, komên baweriyê û gelan bibin.

Ji bo ku rêveberiyên xwecihî bikaribin di pêkanîna aştiya

civakî de rola xwe bileyîzin û jin beşdarî pêvajoyên aştiya civakî bibin, em ê têkoşîna xwe bidomînin.

**Em ê bi navbeynkariya Lijneyên Jinan ên ku em ê bi hemû rêxistinên jinan, însiyatîfên sîvîl, meclîsên taxan û meclîsên jinan ên şaredariyan re dameziřînin, pirsgirêkên xwe yên hevpar bi piştgirî û rêxistinbûnê bi awayekî hevpar çareser bikin.**

Em ê Serokatiyên Daîreyên Polîtîkayên Jinan, Navendên Şêwirmendiya Jinan ên ku Piştgiriyê Didin Têkoşîna li Dijî Tundiya li Hemberî Jinê, Stargeh, Xetên Alo Tundiyê, Navendên Koordînasyona Karesatan ên Jinan, Navendên Kardîtina Jinan, Kooperatîfên Jinan, Bazarên Jinan ên Taxan, Bostanên Bajaran, Wargehên Xwendekarên Jin û Baxçeyên Zarokan dameziřînin û hemû pêdiviyên jinan bikin navenda siyaseta xwe.

### *Em ê di hemû astên rêveberiyên xwecihî de amadekirina butçeya li gor wekheviya zayenda civakî esas bigirin!*

Ligel hemû astengkirinên desthilatdarî û dewletê jî, me hemû xebatên xwe bi butçeyên li gor zayenda civakî meşandin. Me kar û xebatên ku ne tenê ji Tirkiyeyê re, ji hemû cîhanê re bibin mînak kirin. Ji niha û şûnde jî em ê hemû xebatên xwe li gor polîtîkayên butçeya li gor zayenda civakî pêk bînin.

Me rêgeza "gotina jinê esas e" bi tenê di rêzikname û bernameya partiya xwe de pênase nekir, me kir ku di rêzikname û bernameyên hemû rêxistin û partiyên siyasî yên ku em bi wan re tifaqê pêk tînin de jî cih bigirin. Em ê esasgirtina vê rêgezê bidomînin.

Li dijî hişmendiya ku li şaredariyên me yên ku gel bi hilbijartinê bi dest xistibûn qeyûm peywirdar kir û 90 salî paş ve bir, em ê

bi tevahiya hêza xwe modela xwe ya rêveberiyên xwecihî ya ku bajarekî ji bo jiyanê guncaw, ji xwegihandinê re guncaw û her welatî xwediyê mafê gotin û biryarê ve hêzdar bikin.

## *Em ê Honandina Jiyana Azadîparêziya Jinê Ji Nû Ve û Li Cih Bidomînin!*

TJi bo ku jiyana civakî bi nirxên azadî û wekheviyê ji nû ve bê honandin, parastin û bê mayîndekirin, em ê bi polîtîkayên alîgirên jinan û rêgeza rêveberiyên li cih ji nû ve ava bikin.

Em ê ji bo hemû jinên ku li qadên xwecihî dijîn perwerdehiya bi zimanê dayîkê, plansaziya bajêr, avahîsazî, navendên koordînasyona karesatan û rêgeza xwe ya ku divê her kes bi awayekî wekhev ji xizmetên bajêr sûdê wergire, bi awayekî kartêker bisepînin.

Bi polîtîkayên çapemenî, çand û huner, veguhastin, tenduristî, perwerdehî, aborî, xwezaparêzî, ehlaq û bedewiyê em ê polîtîkayên civakî bi awayekî ku jin di navendê de bin û jin bikaribin xwe bigihînînê, bi têgihîştina demokratîk û civakî bi pêş bixin û bi hêz bikin.

Me li bajarên mezin Serokatiya Daîreya Polîtîkayên Jinan, li şaredariyên navçe û bajarên din jî Maseya Jinan, Lijneya Jinan û Gerînendehiya Polîtîkayên Jinan ava kirin. Bi van yekeyan ve girêdayî jî, me yekeyên wek aboriya jinê, têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê, perwerdehiya jinê, Kooperatîfên Jinan û Navendên Jinan damezirandin. Em ê hêzdarkirina hemû saziyên xwe û li gor pêdiviyên xwe avakirina yên nû  bidomînin.

Di serdema nû de ji bo ku polîtîkayên jinan di rêveberiyên xwecihî de bi awayekî kartêker bên sepandin, hemû yekeyên me yên ku ji aliyê qeyûman ve hatine girtin, em ê ji nû ve vekin, zêde bikin û berbelav bikin.

Ji bo ku jin bikaribin bi awayekî kartêker beşdarî pêvajoyên biryargirtinê yên li şaredariyan bibin, em ê "Meclîsên Jinan ên Şaredariyan" ên ku ji hilbijartiyan û xebatkaran pêk bên, damezirînin. Ji bo ku nêrîna jinê rengê xwe bide hemû polîtîkayên xwecihî, "meclîsên di nava meclîsan de" yên ku me damezirandine, bi armanca ku xebatên xwe yên pratîk bimeşînin dê bi "Lijneyên Jinan" û "Koordînasyonên Jinan","Komîsyonên Wekheviya Jin û Mêran" ên ku jin û mêr tê de cih digirin berfireh û berbelav bikin.

Di peymanên tomerî yên ku dê di rêveberiyên xwecihî de bên morkirin de ji bo kesên ku li hemberî jinê tundiyê pêk tînin, dê hebûna xalên danekirinê/mueyîdeyê bidome. Em ê danekirinên cuda yên heta bidawîkirina peymanên mêrên ku li hemberî jinan hemû helwest û tevgerên (tundî, destdirêjî, destavêtin, lêdan, heqaret, pirjinî, hwd) ku nehêlin jin şarezahî û şiyana xwe nîşan bidin, bisepînin.

Em ê di hemû yekeyên ku polîtîkayên jinan diyar dikin de xwerêxistinkirinên xweser ên jinên ciwan bi hêz bikin û piştgiriyê bidin ku bi awayekî kartêker beşdarî mekanîzmayên gotin, erk û biryaran bibin. Di serî de terîqet û cimaetên ku jin bindest kirine, li hemberî hemû êrîşên ku dixwazin hêza veguherîner a jinên ciwan a di qada civakî de têk bibin, em ê rêxistinbûnên wan ên xweser bi hêz bikin.

Li hemberî tunehesibandina keda jinê ya ji aliyê pegala kapîtalîst a serdest a mêrane ve ji bo ku keda xwedîkirina jinê rengekî civakî wergire, em ê polîtîkayan bi pêş bixin, baxçeyên zarokan ên giştî ava bikin û ji bo kal û pîr, nexweş û astengdaran xizmetan pêşkêş bikin.

Peymana Stenbolê ya ku yek ji rêyên herî girîng ên têkoşîna li hemberî tundiyê bû, bi biryareke nîvê şevê ya rejîma yekkesî hat betalkirin û dozên ku li hemberî vê biryarê hatin vekirin jî bêencam man, nehatin pejirandin. Ev yek bi awayekî vekirî û fermî

erêkirina her cureyê tundiyê ya li hemberî jinan e. Em vê yekê dibînin û napejirînin. Ji bo ku Peymana Stenbolê ya ku yek ji yek destkeftiyên jinan ên gerdûnî ye bi awayekî kartêker bê sepandin, em ê têkoşîna xwe ya rêxistinî ya hevpar a ku me heta niha meşandiye, bidomînin.

Em bi hêz in; lewra têkoşîna me ya jinê heye, lewra em carekê bi ser ketin, lewra em dizanin ku em ê careke din bi ser bikevin, lewra şiyan û biryardariya me ya ku em baştir bikin heye!

Em bi hêz in; lewra yên ku têdikoşin û yên ku li ber xwe didin dîrokê ava dikin, desthilatdar na!

Em bi biryar in; em ê rêveberiyên xwe yên xwecihî ji qeyûman rizgar bikin, bi modela xwe ya rêveberiyên xwecihî ya demokratîk, xwezaparêz û azadîparêziya jinê bibin yek ji çavkaniyên herî mezin ên têkoşîna jinan a sedsala 21'emîn.

## *BI VÎNA JINÊ DEMOKRASIYA XWECIHÎ; EM DEV JI HEVSEROKATIYÊ BERNADIN!*

Em ê dev ji pergala xwe ya hevserokatiyê ya ku felsefeya xwe ji dozîneya hevjiyana azad digire û îro ji bo tevahiya cîhanê



bûye mînak bernedin. Wek jin û mêr, bi hev re rêvebirina gund û bajarên xwe, di mekanîzmayên gotin û biryarê de bi hev re têkoşîn û xizmetkirin, dê ji bo azadiya jinê û azadiya civakê her tim destkeftiya me ya herî mezin be. Bi awayekî ku nûnertiya wekhev û di rêveberiyên xwecihî de rêxistinbûna jinê bi hêz bibe;

- Em ê pergala hevserokatiyê li hemû şaredariyên xwe yên bajarên mezin, bajar, navçe û bajarokan bisepînin.
- Em ê Akademiyên Siyaseta Jinan, Dibistanên Polîtîkayên Jinan ên Rêveberiyên Xwecihî berbelavtir bikin.
- Dê meclîs û lijneyên me yên jinan ên rêveberiyên xwecihî di platformên xwecihî de cih bigirin û bi hevkariyê piştgiriyê xurt bikin.
- Em ê hêz û rêxistinên jinan ên xwecihî jî beşdarî pêvajoyên biryargirtinê yên rêveberiyên xwecihî bikin.
- Meclîsên jinan ên şaredariyan ên ku yek ji stûnên bingehîn ên pergala hevserokatiyê ne, lijneyên jinan, yekeyên wekheviyê ava bikin û bidin xebitandin.

## *Em Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Butçeyên Li Gor Wekheviya Zayenda Civakî Esas Digirin!*

Em hemû cureyên butçeyan ên ku dibin sedema newekheviya zayenda civakî, li pişt deriyan tên amadekirin, di naveroka wan de jin, ciwan û derdorên cuda cih nagirin çi di asta navendî de û çi jî di asta xwecihî de bi destên mêran tên amadekirin, red dikin. Hişmendiya butçeyê ya ku li ser zayendparêzî, rantxwurî û talanê hatiye avakirin û îro bi destê qeyûmên ku dest danîne ser vîna jinê tê meşandin newekhevî kûrtir kiriye. Em ê bi hişmendiya rêveberiyên xwecihî yên demokratîk, xwezaparêz û azadîarêziya jinê berî qeyûman bidin û yên ku xizmetên xwecih bi awayekî

wekhev pêşkêş bikin jî, em jin in.

Em ên ku di tevahiya qadên jiyanê de hene, hildiberînin û kedê didin in. Em nîvê civakê ne. Em ê bikin ku di her asta rêveberiyên xwecihî de nûnertiya wekhev a gotin û biryarê pêk bê, pêdivî û daxwazên jinan li ber çavan bên girtin û di butçeya ku li gor pêdiviyên zayenda civakî hatine amadekirin de cih bigirin zêdetir bixebitin.

- Em ê hemû pêvajoyên plansaziya stratejîk,amadekirina butçeyê, nîqa û biryargirtinê yên li şaredardiyên xwe bi beşdariya çalak a meclîs û rêxistinên jinan bimeşînin û beriya ku xebatkarên şaredariyê dest bi kar bikin, dê perwerdehiya zayenda civakî wergirin.
- Di hemû beşên lêçûnên ku ji bo xizmetên rêveberiyên xwecihî tên veqetandin de, em ê wekheviya zayenda civakî esas bigirin û xizmetan di wê çarçoveyê de pêşkêş bikin.
- Ji bo ku em pirsgirêkên gund, tax û bajaran çareser bikin, em ê li gor vîna jinan “Meclîsên Taxan” damezirînin û bi hev re biryaran bidin.



## *Em ê Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Ji Nû Ve Ava Bikin!*

Cihên ku jin lê hildiberînin, bi nîqaşan hest û ramanên xwe diderbirînin di heman demê de ji bo me cihên ku bîr zindî tê hiştin in. Em dixwazin torên ku me li hemberî polîtîkayên ku li ser bingeha zayendparêzî û bişaftinê hatine avakirin zêdetir bi hêz bikin. Di vê çarçoveyê de, zêdekirina cihên ku jin bikaribin di qadên ziman, çand, huner û sporê de hêz û şiyana xwe bi awayekî hêzdar bidin der, yek ji pêdiviyên nêzikatiya me ya rêveberiyên xwecihiyî ye. Di vê çarçoveyê de;

- Em ê navendên xwe yên bîra jinê ji nû ve ava bikin!
- Li dijî polîtîkayên bişaftinê, malên çandê yên jinan ên ku em ê bikaribin lê bi zimanê xwe hunerê biafirînin û projeyên xwe yên malên dengbêjan bi awayekî hêzdartir pêk bînin.
- Em ê ji gundan dest pê bikin, li taxan, navçeyan û bajaran Malên Çandê yên Jinan  zêde bikin. Em ê wan deran veguherînin cihên ku jinên temendirêj ezmûn û serpêhatiyên xwe ragihînin.
- Em ê hejmara wargehên xwe yên sporê yên jinan  ên ku jin bê



pere bikaribin jê xizmetê bigirin, zêde bikin.

- Em ê li cihên diyarkirî, di demên salê yên diyarkirî de Mîhrîcanên Çand û Hunerê yên Jinan li dar bixin.
- Em ê pirtûkxaneyên xwe yên jinan ên ku hatine girtin û naveroka wan hatiye guhertin ji nû ve ava bikin.

## *Em ê Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Li Dijî Xizaniya Jinan Tev Bi Hev Re Têbikoşin!*

Pergala kedxwariyê ya neolîberal keda jinê bi awayekî bêperwa talan kiriye, xizanî, bêkarî û kedxwariya jinê bi taybetî bi pêvajoya pandemiyê re kûrtir û zêdetir bûye. Qeyrana aborî ya ku ji ber polîtîkayên şer û tundiyê welat ketiye navê, kiriye ku jin nikarin pêdiviyên xwe yên ferz jî bi cih bînin. Li dijî polîtîkayên mêrane yên zayendparêz ên ku ji xwarin, sifre û keda jinê didize û butçeya şer amade dike, dixwaze jinan derxe derveyî qadên hilberînê û xizaniyê wek çarenûsekê li ser jinan ferz dike em ê hilberîna li cih û xwecih esas bigirin. Em ê qadên hilberîna komunal ên ku keda jinê berbiçav dikin, jinan beşdarî her qada hilberînê dikin û derfetê didin ku jin aboriya xwe ava bikin, ji nû ve damezirînin. Em ê di binê banê şaredariyan de gerînendehiyên aboriya jinan damezirînin û bi jinan re;

- Qadên pîlot diyar bikin, Kûrsên Pîşeyî û Firotinê yên Dîjîtal vekin û berbelav bikin. Em ê jinên ku van kûrsan kuta bikin ji bo hilberînê teşwîq bikin û derfeta ku berhemên xwe li bazarên dîjîtal bifiroşin bidin wan.
- Ji bo ku aboriya jinê bi pêş bikeve, em ê bernameyên piştgirî û handanê amade bikin. Em ê piştgiriyê bidin daxwazên jinan ên bi awayekî çalak beşdarbûna jiyana aborî. Ku kargehên xwe vekin, em ê xerc û bacên ku dê bidin şaredariyên me kêm bikin.

Em ê projeya xwe ya **"Kooperatîfên Jinên Azad"** ji nû ve bidin destpêkirin.

Di çarçoveya vê projeyê de;

- Em ê bi kooperatîfên jinan ên heyî û yên ku dixwazin bên vekirin re peymanan çêbikin û bikin ku ev kooperatîf zêde bibin.
- Jinên ku hewl bidin van kooperatîfan ava bikin, ji bo ku bikaribin wan peymanan pêk bînin, em ê ji bo wan yekîneyên alîkariya beralîkirinê û piştgiriyê ava bikin û piştgiriyê bidin jinan.
- Ji bo ku berhemên kooperatîfên jinan ên li qadên gundewar û jinên hilberîner veguhêzin, em ê navendên depokirinê yên ku piştgiriya lojîstîk bidin, ava bikin.
- Em ê projeyên "bostanên bajaran ên jinan" û "bostanên ber devê derî" ji nû ve bidin destpêkirin. Em ê bi navbeynkariya "malên tov" ên ku em ê vekin, şitlên bê pere belav bikin.
- Em ê "Navendên Înovasyon û Aboriya Jinê" vekin û piştgiriyê bidin raman û hewldanên nû.
- Em ê projeyên xwe yên bazarên taxan û standên mor ên ku em ê bi butçeya jinan a ku di butçeya şaredariyên bajar û navçeyan de hatiye destnîşankirin, bi pêş bixin û berbelav bikin. Ji bo ku jin bikaribin berhemên xwe yên ku li kooperatîf, mal û bostanan hildiberînin bê navbeynkar bifiroşin, em ê li her derê qadên bazarê vekin.
- Em ê her sal di çarçoveya projeyên xwe yên "Aboriya Jinê" de, li cihên diyarkirî standên hilberînerên jin vekin û mîhrîcanên ku bikaribin berhemên xwe nîşan bidin li dar bixin.
- Em ê bi sepanên pîlot rê û çewligên tûrîzma gundewar ên ku jin lê xebatên aborî bimeşînin çêbikin.

- Em ê derkevin derveyî rolên pîşeyî yên ku ji aliyê newekheviya zayenda civakî ve hatine diyarkirin û bikin ku jin bi rêya KÎGEM'an (Navenda Hînkirina Kar a Jinan) di qadên teknîkî de xwe bi pêş bixin, kar bibînin û jin jî bikaribin di karên wek ajovanî û tamîrkariyê de bixebitin, em ê projeyên xwe ji nû ve bidin destpêkirin.
- Em ê ji bo jinan sepana JIN KART a kêmbuha li hemû şaredariyên xwe bisepînin.
- Em ê projeya xwe ya PED-MATÎKê ya ku jin bikaribin pêdiviyên xwe yên pedan û kereseyên paqijiyê bi dest bixin li herêmên diyarkirî pêk bînin û li gor pêdiviyan hejmara wan zêde bikin. Em ê pergaleke ku bikaribe kel û pelên paqijiyê bigihîne hemû jinên ku pêdiviya wan heye ava bikin.
- Em ê di rêveberiyên xwe yên xwecihî de, di mijarên wek kûrsên pîşeyî, destkarî û kooperatîfvaniyê de perwerdehiyên berbelav



bidin. Em ê di van kûrsan de pêşekiyê bidin jinan û komên kêmderfet.

- Em ê şaredariyên pîlot diyar bikin û malperan saz bikin. Em ê di binê banê şaredariyan de "Marketên Koman" ên dîjîtal vekin û yên ku pêdiviya wan hebin dê bi rêya nivîskî ji wê malperê ragihînin û bi wî awayî ji xurekan bigire ta cil û bergan, ji alav û amûrên nav malê bigire ta pêdiviyên wekî din dê bi awayekî bê pere bikaribin ji van deran peyda bikin. Dê ev yek piştgirî û hevgiriyê xurtir bike.

## *Em ê Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Bi Jinên Ciwan Re Polîtîkayan Bi Pêş Bixin!*

Jinên ciwan di nava civakê de bi gelek cureyên tundiyê re zêdetir rû bi rû dimînin. Bi taybetî van salên dawîn, êrîşên şerê taybet ên ku zêde bûne bi awayekî giran bandorê li jiyana jinên ciwan dike. Li hemberî astengiyên di qada perwerdehî, aborî û têkoşîna polîtîk de, ji bo ku em polîtîkayên berfireh bi pêş bixin, em ê bi jinên ciwan re nîqaş bikin û li gel wan têbikoşin. Em ê bi paradîgmaya xwe ya rêveberiyên xwecihî yên azadîparêziya jinê, bi jinên ciwan re têkoşînê berbelav bikin

- Em ê xebatên hişyarkirinê yên ji bo jinên ciwan bidomînin. Em ê bi hev re rêbazên têkoşîna li dijî tundiya mêr nîqaş bikin û bisepînin.
- Ji bo hêzdarkirina jinên ciwan, em ê navendên ku xebatên bê pere yên wek perwerdehî û çand û hunerê dimeşînin, vekin.
- Ji bo jinên ciwan ên xwendekarên zanîngehan ên ku pirsgirêka wan a stargehê hebe, em ê projeyên xwe yên wargehan ji nû ve bixin meriyetê.
- Em ê li derdora wargehên ku jinên ciwan lê dijîn û rawestgehên




otobêsan pergalên ronîkirinê yên bihêztir saz bikin.

- Em ê alîkariya aborî bidin jinên ciwan ên ku zanîngeh kar kirine lê ji ber kêmderfetiyên aborî nikarin biçin zanîngehê yan jî perwerdehiya xwe ya zanîngehê bidomînin.

## *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Projeyên Me Yên Di Çarçoveya Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Hemberî Jinê De*

Polîtîkayên desthilatdariya serdest a mêrane yên yekparêz, zayendparêz û mîlîtarîst bûne sedem ku tundiya li hemberî jinê kûrtir û zêdetir bibe. Desthilatdariya ku çav berî maf û destkeftiyên jinan daye bi destê qeyûman navendên têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê girtiye û mekanîzmayeke ku jin serî lê bidin li holê nehiştiye. Ji Peymana Stenbolê vekişiya û bi awayekî zelal nîşan da ku dê jiyana jinan neyê parastin. Çav berî mafê nafakayê daye

û zagona bi hejmara 6284'an ji xwe re kiriye armanc. Di binê navê hêzdarkirina malbatê de, dixwazin jinan di malê de bigirin û di nava malbatên ku dixwazin biparêzin de qirkirina jinan didome. Rê li tundiya nava malê tê vekirin.

Di rewşeke ku tundiya li hemberî jinê ji % 1400 zêde bûye de, li dijî yên ku çav berî mafên jinan ên ku hatine bidestxistin didin, têkoşîna herî mezin em dimeşînin. Polîtîkayên ku tiştên ku ji me hatine stendin paş ve wergirin û destkeftiyên me zêdetir bikin, em ê hemû bi hev re bi pêş bixin. Di çarçoveya têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê de belgeyên navneteweyî yên wek CEDAW, Danezana Pekînê û Peymana Stenbolê yên ku destkeftiyên têkoşîna jinan in em ê bixin meriyetê û wek referans bipejirînin.

- Li hemû bajar û navçeyên ku gelheya wan ji 100.000'î zêdetir be em ê şert û mercên guncaw amade bikin û bi şaredariyên me ve girêdayî, stargehan ji nû ve vekin.
- Em ê navendên xwe yên têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê yên ku piştgiriya derûnî û hiqûqî didin û ji bo aboriya xwe qadên hilberînê ava dikin ji nû ve vekin.
- Em ê stasyonên xwe yên gavê pêşîn ê têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê ji nû ve vekin û hejmara wan zêde bikin.
- Di vekirina stargeh û navendên têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê de em ê bi sazî û dezgehên sîvîl ên ku li bajêr xebatên jinan dimeşînin re hevkariyê bikin û peymanên xebatên hevpar amade bikin.
- Em ê li dijî her cure tundiya li hemberî LGBTÎ'yên ku ji ber nasnameya xwe ya zayendî ya cuda û meylên xwe yên zayendî dibin armanc, têbikoşin.

- Lijne û meclîsên me yên jinan ên ku dê di çarçoveya rêveberiyên xwecihî de bên avakirin dê bi derdorên jinên bajêr re têkoşîna hevpar bimeşîne, têkiliyan deynin û ji bo astengkirina tundiya mêran a li hemberî jinan û nasnameyên zayendî yên ji nasnameyên serdest cudatir, xebatên piralî bimeşînin.

- Di vekirina stargeh û navendên hevgirî û têkoşîna li dijî tundiyê de em ê xebatkarên ku di qada xwe de pispor û xwedîezmûn bin peywirdar bikin.

- Ji bo ku jin û zarokên ku li stargehan dimînin bi awayekî bi pergal û baş bikaribin beşdarî xebatên civakî bibin, em ê avaniya fizîkî ya stargehan li gor zarokan sererast bikin. Ji bo zarokên ku li stargehan dimînin ên di serdema baxçeyê zarokan de û di serdema dibistanê de ji bo ku bikaribin sûdê ji xebatên navendên perwerdehî û amadehiyê wergirin, em ê peymanên pêwist mor bikin.

- Em ê li hemû şaredariyên xwe “XETA ALO TUNDIYÊ” ya pirziman û ku rojê 24 saetan bixebite, ji nû ve saz bikin.

- Ji bo bergirtina îstîsmara zarokan a di binê navê zewacê de em ê têkoşîneke kartêker bimeşînin. Ji bo şênberkirinê, em ê perwerdehiyê û xebatên şiyarkirinê bikin.

- Di serî de zarokên keçîn, ji bo ku hemû zarok bikaribin perwerdehiya xwe bidomînin, em ê xizmetên wargeh û înternetê yên bê pere pêşkêş bikin.

- Ji bo pêşîlêgirtina îstîsmar û hemû cureyên tundiyê yên li hemberî zarokan, em ê tedbîran wergirin. Bi vê armancê em ê li dijî îstîsmar û îhmalkirina zarokan, yekeya “têkoşîn û şêwrê” ava bikin, ji bo mezin û zarokan xebatên şiyarkirinê bimeşînin.




- Li dijî hişmendiya ku karbeşiya zayendparêz xurt dike, em ê xebatên ku azadî û wekheviya zayenda civakî esas digire bimeşînin.
- Cinsiyetçi iş bölümünü pekiştiren kalıplara karşı toplumsal cinsiyet eşitliğini ve özgürlüğünü esas alan çalışmalar yürüteceğiz.

### *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Bi "Plana Çalakiyan a Karesatan a Jinê" Ji Bo Ku Karesat Veneguherin Hilweşînê Em ê Bi Hev Re Têbikoşin!*

Li Tirkiyeya ku welatekî karesatan e, salane bi dehan karesat tên jiyîn. Pergala modernîteya kapîtalîst dike ku bandora karesatan zêdetir hilweşîner be. Hişmendiya rant û talanê ya ku desthilatdariyê afirandiye, bajarvaniya çelexwarî, daristanên ku ji bo avahiyan tên vekirin, besteroyên çeman, qadên jiyana xwezayî, her sal dibe sedema bi hezaran wendahiyên madî û manewî.

Karesatên xwezayî nikarin bên astengkirin lê bi rêya bajarvaniya rast, perspektîfeke ekolojîk û amdekirina civakê ya li hemberî karesatan, bandorên wan dikarin bên kêmkirin. Lewra sedema bandorên hilweşîner ne karesat in; ji ber ku di pêvajoya amadehiya karesatan, destwerdana lezgîn û başkirinê de plansaziyeke hevgirtî ya ku newekheviyan li ber çavan digire nayê çêkirin û derfetên pêwist nayên veqetandin, ev encam dertên holê.

Bi taybetî di erdhejên 6'ê reşemiyê de me dît ku ev hişmendiya rantxwur li hemberî karesatan tu bergirî wernegirtine. Di vê pêvajoya ku hemû biryar bi destê rêveberiya navendî tên girtin de me careke din, girîngiya rêveberiyên xwecihî ya di dema karesatan de fam kir û me dît ku di karesatan de dîsa yên ku herî zêde di binê bandorê de dimînin, tên mexdûrkirin, ji ber newekheviya zayendî, jin û komên kêmderfet in.

Wek her polîtîkaya ku cudakariya zayendî paşguh dike, di polîtîkaya karesatan de jî wek Meclîsa Jinan a Partiya DEM'ê, kirina xebatên xweser, xebateke bingehîn a ku me daye pêşiya xwe ye. bi vê armancê, em ê li şaredariyên xwe "Plana Çalakiyên Karesatan a Jinan" a ku ji sê gavan pêk tê bixin meriyetê û ji bo karesatan xebatên berfirehtir bikin.

## • Gavê Yekemîn

- Dê li her şaredariya me "Plana Çalakiyên Karesatan a Jinan" bi awayekî xweser bê avakirin û bi awayekî fermî bê pejirandin.
- Dê bi awayekî lezgîn planên perwerdehiya karesatan bê amadekirin, li taxan û qadên gundewar ji bo jinan xebatên hişyarkirinê yên taybet bên kirin.
- Dê bi sazî û dezgehên jinan ên li bajêr re xebatên hevpar bên meşandin. Dê li gor her bajar û qada gundewar, li gor pêdiviyê

plansazî bê çêkirin.

- Dê li her bajarî, li gor pêdiviyên bingehîn xebata fizîbîlîteyê bê kirin û pêdiviyên xweser ên ku dibe lazim bibin dê beriya karesatan bên amadekirin.
- Ji bo xebatên destwerdana pêşîn, lêgerîn û rizgarkirin, parastina sîvîl ên beriya karesatê û piştî karesatê, dê hejmara xebatkarên jin ên pispor bê zêdekirin

## Gavê Duyemîn

- Ji dema karesatê û şûnde dê rewşa heyî û pêdivî bi lezgînî bên destnîşankirin û koordînasyona bikaranîna derfetan bê pêkanîn.
- Em ê li qadên karesatan komên jinan ên dildar amade bikin. Di her asta koordînasyona karesatan a lezgîn de em ê beşdarî û nûneriya wekhev pêk bînin.
- Em ê agahiyên der barê koordînasyona karesatê de bi awayekî pirzimanî û lezgîn bigihînin jinan. Ji bo agahdarkirina jin û zarokên keçîn ên kêmderfet, em ê xebatên taybet bimeşînin.
- Ji bo ku jin û zarokên astengdar ji piştgiriyê heyî agahdar bibin û bikaribin xwe bigihîninê, em ê bi rêbazên ku bikaribin xwe bigihîninê û sûdê jê wergirin agahdarkirinê pêk bînin.
- Ji bo pêkanîna ewlehiya canê jinên koçber û penaber, em ê bergiriyên pêwist wergirin.

## Gavê Sêyemîn

- Wek şaredarî, piştî karesatan, herî kêm salekê, em ê kel û pelên paqijiyê yên ku jin û zarok bikaribin jê sûdê wergirin bi awayekî bi pergal belav bikin.
- Em ê navendên stirîna demkî yên li gor pêdiviyên jinan guncaw, amade bikin. Li van navendan dê mirov bikaribin bi hêsanî xwe




bigihînin xizmetên bingehîn ên wek avê, paqijî û ewlehiyê. Dê qadên wek cilşo, baxçeyên zarokan û xwedîkirinê hebin û bi awayekî ku jin bikaribin bi hev re têkiliyên civakî deynin dê ev qad bên sererastkirin.

- Dê ji bo jinên bi tenê, kesên LGBTÎ, jinên ku di pêvajoya hevberdanê de ne û jinên mexdûrên tundiyê navendên stirînê yên demkî yên xweser bên avakirin.
- Li qadên stirîna demkî xebatkarên ewlehiyê yên li dijî tundiya mêran perwerdekirî hebin û dê yekeyên xizmetên civakî bên sazkirin.
- Em ê ji bo berasteng, kesên ku pêdiviya wan bi xwedîkirinê heye û kal û pîran navendên lênêrînê ava bikin û lênêrînê bi jinên ku neçarî xebatê bin re bikin.
- Em ê yekîneyên tenduristiyê yên gerok ên ku xizmetên tenduristiyê yên gavê pêşîn pêşkêş bikin, ava bikin. Em ê jinên ducanî bi awayekî bi rêk û pêk bişopînin, em ê xwegihandina alav û amûrên kontrolkirina zayînê hêsan bikin û em ê bikin ku jin ji xizmetên tenduristiyê sûdê wergirin.

- Ji ber ku xebatên piştî karesatê û veguhastina lojîstîkê xebatên pir berfireh in, divê bi rêxistinên civakî yên sîvîl û rêxistinên jinan re bi awayekî kolektîf û têkildar bên meşandin.
- Dê piştgiriya derûnî ya bi zimanê dayîkê bê pêşkêşkirin û li pêvajoyeke berfireh bê belavkirin. Ji bo ku bi van zimanan kar û bar û daxwazên hiqûqî bên şopandin, dê torên pêwist bên avakirin.
- Dê bi komên ku ji beytarên dildar pêk bên, pêdiviyên ajalan ên tenduristî, xwedîbûn û stirînê bên çareserkirin.
- Di mijarên wek şopandina bûyerên tundiya li hemberî jinê, şopandina jin û zarokên wendabûyî de, dê bi rêxistinên civakî yên sîvîl re hevkarî bê kirin. Ji bo ku tu dane veşarî nemînin, em ê bergiriyên pêwist wergirin.
- Piştî stirîna demkî, dê li bajar û gundan avahiyên vala bên destnîşankirin, têkilî bi xwediyên wan re bên danîn û ji bo ku kesên ji bo karesatan bandor bûne sûdê ji wan avahiyan wergirin, em ê piştgiriya madî bidin.

## *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Em ê Ji Bo Astengdaran Jiyaneke Nû Bi Jinên Astengdar re Ava Bikin!*

Polîtîkayên ku saxan diparêzin îro li pêşiya beşdarbûna jiyanê ya jin û zarokên keçîn ên astengdar astengên herî mezin in. Ji ber ku ji bo jin û zarokên keçîn ên astengdar polîtîkayên pêwist nehatine amadekirin, kuçe ji bo van kesan veguherîne cihên ku rastî her cureyê îhmal û îstîsmarê werin.

- Xwedîkirina nexweş, kal û pîr û astengdaran gelek caran dibe barê ser milê jinan. Destmiza ku di binê navê keda lênêrînê de tê dayîn, têra pêdiviyên kesên astengdar bixwe jî nakin.



- Em ê zimanê îşaretan ê bi Kurdî li her qada ku em lê hebin, belav bikin.
- Em ê navendên jiyanê yên jinan ên bê asteng ava bikin. Em ê li van navendan bi jin û zarokên astengdar re çalakiyên hevkarî û piştgiriyê li dar bixin û xebatên şiyarkirinê bi hev re bikin.
- Ji bo ku jinên astengdar bikaribin beşdarî jiyana civakî bibin, dê di binê banê Gerînendehiyên Jinan û Serokatiyên Daîreyên Jinan de ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku di bikaranîna xizmetên wek perwerdehî, tenduristî, spor, stirîn, veguhastin û xebatê de tên jiyîn Yekîneyên Wekheviyê bên damezirandin.
- Hemû avahiyên ku em ê ava bikin, em ê bi awayekî ku kesên astengdar bikaribin xwe bigihînin ê sererast bikin.
- Em ê piştgiriyê bidin jinên ku li nexweş, kal û pîr û astengdaran dinihêrin. Li gor daxwaz û pêdiviyên wan em ê polîtîkayan amade bikin û wan polîtîkayan bisepînin.
- Li taxan ji bo jinên ku dixebitin û yên ku zarokên wan ên astengdar hene, em ê baxçeyên zarokan vekin û xebatên piştgirî

û hêzdarkirinê yên xweser li hemû saziyên xwe bimeşînin.

- Em ê bi "Platforma Dildarên Bajêr" re li gund û bajaran bi taybetî ji bo pêdiviyên kal û pîr, bêkar û astengdaran platformekê ava bikin. Ji boyaxkirina malê bigire ta tamîrên biçûk ên malê, ta projeyên ku hestiyariya bajêr dixwazin di gelek qadan de bi piştgiriya şaredariyê, em ê torên xwe yên dildaran ava bikin û bi wan re bixebitin.

## *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Em ê Polîtîkayên Tenduristiyê yên Li Gor Wekheviya Zayenda Civakî Bisepînin!*

Di xwegihandina tenduristiyê ya ku mafê mirovan ê bingehîn e de îro pirsgirêkên herî mezin jin dijîn. Bi taybetî di pêvajoya pandemiyê de jiyana jinên ku neçarî xebata di qadên nepaqij de bûn kirin xetereyê. Polîtîkayên tenduristiyê yên ji bo rant û karê hatine meşandin û bi van polîtîkayan jiyana bi sedan jinan xistine xetereyê. Li Tirkiyeyê yek ji cureyên pençeşêrê yên ku herî zêde tê dîtin, pençeşêra devê malzarokê ye. Parzaya HPV'yê ya ku li hemberî vê nexweşînê tê bikaranîn ji ber ku pir buha ye û nikare bê bidestxistin. Ji ber vê yekê jiyana gelek jinan dikeve xetereyê. Li hemberî polîtîkayên tenduristiyê yên yekparêz û zayendperest, em ê her û her bibêjin "tenduristiya bi zimanê dayîkê yê bê pere maf e".

Li gor baweriya me, polîtîkayên tenduristiyê berpirsiyariyên bingehîn ên rêveberiyên xwecihî ne. Di vê çarçoveyê de;

- Em ê polîtîkayên xwe yên tenduristiyê bi jinan re, bi rêxistinên jinan re amade bikin.
- Em ê xizmeta tenduristiyê ya bi zimanê dayîkê ya ku mafekî bingehîn ê civakî ye, esas bigirin.
- Em ê li şaredariyên xwe yekeyên tenduristiyê ava bikin û ji bo tenduristiya jinan projeyên taybet bi pêş bixin.



- Em ê bi yekîneyên xwe yên ku xebatên têkildarî tenduristiya jinan dimeşînin re komxebatên wek anatomiya jinan, serê mehê, menopoz, nexweşînên domdar, pençeşêra pêsîrê û hwd li dar bixin.
- Em ê yekîneyên tenduristiya jinan ên gerok pêk bînin, li gund û taxan venêrînên tenduristiyê yên bê pere çêbikin û xebatên perwerdehiyê berfireh bikin.
- Em ê şaredariyên pîlot diyar bikin û navendên xwe yên tenduristiya jinan ji nû ve vekin.
- Li navendên me yên ku dê jin bê pere muayene bibin, em ê xebatên xwe li gor pêdiviiyên jinan nû bikin.

## *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Em ê Qadên Jiyanê Yên Li Gor Jinan ên Ekolojîk Ava Bikin!*

Siyaseta şerê dagirker a ku ji bo rant û sermayeyê, ji aliyê desthilatdariyên mêrane yên kapîtalîst ve tên meşandin li her dera cîhanê têkçûnên ekolojîk ên mezin pêk tîne. Qeyrana kişwerê ya ku tê jiyîn nîşana herî şênber a têkçûna ekolojîk e. Îro siyaseta li welêt a li se bingeha rant û sermayeyê parçeyekî pergala kapîtalîst e.

Newalên me, daristanên me, darên me, zeytûnên me tên

armancgirtin. Dixwazin qadên me yên jiyanê vala bikin. Xwezaya me bingeha polîtîkaya me ya rêveberiyên xwecihî yên azadîparêziya jinê, demokratîk, xwezaparêz û azadîparêziya jinê ye. Sepandina polîtîkayên ku qadên me yên jiyanê biparêzin di rêveberiyên xwecihî de berpirsiyariya me ya pêşekî ye. Di vê çarçoveyê de;

- Em ê xwezaya xwe û qadên xwe yên jiyanê li dijî siyaseta rant û talanê biparêzin û bi tu awayî dev jê bernedin.
- Em ê li şaredariyên xwe "yekîtiyên ekolojiyê" ava bikin.
- Em ê bajarên ekolojîk û li gor jinê tev bi hev re ava bikin.
- Em ê polîtîkayên ku gund û bajarên me li gor avaniya xwezaparêz sererast bikin bisepînin.
- Em ê bi perspektîfa jinê, li bajaran qadên şênkahiyê berfireh bikin û rûyê bajaran ê nû li ser bingeha aştiya mirov û mirov, mirov û xewza, gund û bajar ava bikin.
- Em ê nehêlin ku bajar ber bi qadên çandiniyê, çêregeh, daristan, qamûşan, gol û besterûbaran ve fireh bibin. Di rêziknameyên têkildar de em ê sererastkirinên zelal pêk bînin.
- Em ê avahîsaziya bajêr li ser bingeheke xwezaparêz û nêrîna jinê sererast bikin. Em ê qadên hevpar, kuçe, qad, park, rawestgeh, peyarê, bi kinasî hemû cihên bajêr bikin cihên ku jin bikaribin bi awayekî azad û ewle bi kar bînin.
- Em ê her sal bi diruşma "Ku dareke te ya çandî tune be, tu jî tune yî" li gor demsalan kampanyayên danîna daran li dar bixin. Em ê daristanên xwe yên bajaran bi jinan re ava bikin.
- Em ê piştgiriyê bidin kooperatîf û gundên xwezaparêz ên ku jin

di hilberîna çandiniyê de li ser bingeheke xwezaparêz û jinparêz dixebitin û diafirînin.

## *Di Demokrasiya Xwecihî De Bi Vîna Jinê Em ê Piştgiriya Bi Jinên Koçber û Penaber Re Zêde Bikin!*

Berdêlên herî giran ên polîtîkayên şer û tundiyê em jin didin. Yek ji van berdêlên giran jî koç e. Jinên ku neçarî devjêberdana qadên xwe yên jiyanî dibin, li cihên ku diçinê gelek caran bêyî ku hay ji wan hebe, ji bo domandina jiyana xwe têdikoşin. Çi li wan deran û çi jî di rêyên koçberiyê de bi her cureyê tundî û îstîsmarê re rû bi rû dimînin. Ji aliyê din ve, jinên koçber û penaber wek hêza kar a erzan tên dîtin, keda wan bi awayekî bê perwa tê xwarin. Em ê bi paradîgmaya xwe ya rêveberiyên xwecihî ya azadîparêziya jinan, di vê çarçoveyê de;

- Sekna xwe ya li hemberî polîtîkayên şer û tundiyê bidomînin.
- Di binê banê Serokatiya Daîreyên Polîtîkayên Jinan de yekeyan pêk bînin, ji bo çareserkirina pirsgirêkên wek beşdariya jinên koçber a jiyanê, kar, ziman, tundî, xwegihandina tenduristiyê, zewicandina zarokan, hêwîanîna serê, kedxwarî, perwerdehî, stirîn, veguhastin û hwd bixebitin. Ji bo ku koçber û penaber bikaribin çand û zimanê xwe bi awayekî azad bi kar bînin û bijîn, li bajarên ku lê bi cih bûne bikaribin bi awayekî wekhev û azad beşdarî jiyana civakî bibin, em ê polîtîkayan bi pêş bixin.
- Em ê torên piştgiriya bi jinên koçber û penaber re berfirehtir bikin. Em ê bi komele û saziyên ku di vê qadê de xebatan dimeşînin re polîtîkayên hevpar bi pêş bixin.
- Em ê polîtîkayên ku jinên koçber û penaber ên ku rastî tundiyê

tên bikaribin ji stargehên jinan û navendên têkoşîna li dijî tundiyê sûdê wergirin, bisepînin.

- Tundiya zayendî ya ku jinên koçber û penaber pê re rû bi rû dibin, zewaca bi darê zorê, bazirganiya mirovan û hemû cureyên tundiyê yên wek wan bi berpirsên qadan re em ê planên têkoşîneke kartêker amade bikin.
- Ji bo ku jinên di kampên penaberan de dimînin bikaribin di şert û mercên mirovî de bijîn, binpêkirinên mafên mirovan ên di van qadan de bên astengkirin û hemû kam ji aliyê SCS û saziyên jinan ve bikaribin bên venêrîn, em ê xebatan bikin.

Ji bo jiyan û dahatûyeke azad û wekhev, me jinan ev xebat tev kirin. Em bi hev re bi ser ketin. Em ê niha careke din bi ser bikevin, em ê careke din bajarên hîn azadtir bi ked û têkoşîna jinê ava bikin! Wek Meclîsa Jinan a Partiya DEM'ê, bi hêza ku em ji dîroka xwe û têkoşîna xwe ya jinan digirin, careke din dibêjin ku;

## *Em Bi Ser Ketin, Em ê Dîsa Bi Ser Bikevin!*

## *Em ê Tev Bi Hev Re Bi Vîna Jinê Demokrasiya Xwecihî Ava Bikin!*

# DEMA JINAN VÎNA JINAN

DEM PARTİ

MECLISA JINAN


JIN JIYAN AZADI
AZADIYA JINÊ AZADIYA CIVAKÊ
SAVAŞA, ŞİDDET
KARŞI
HAYATLARIMIZI
SAVUNU
SATILIKTIR


KIRAATHAN
TE, YOKSULLUĞA
BARIŞI,
ve HAKLARIMIZ
UYORUZ.
URFA İL KADIN P
"Ceren Damar kalemdir, kitaptır mahalledir."
İYAN
ADİ.